
PolitikART

KOVARA 3 HEFTANE YA WÊJE HUNER Û RAMANÊ

12 Cotmeh 2019 Şemî

HEJMAR: 269



# Çiya serî natewînin

Foto: Gökmen Önay



Navê jiyanê ne zarokî û pîrî ye, lê herdu jî parçeyên wê ne. Ev pîrejin Pîroz e. Ew ji Birîfkayê ye li devera Berwarî Bala. Temenê wê 100 sal e.
Li wêneya jor jî zarok di Kaniya Gundê Buselê de ne, tevî petîx û şimamokan ku di nava avê de dicemidin. Herdu wêne jî Hesen Hecî (Hasan Haji) girtine.



**Herausgeber:** *Medya Presse-und Werbeagentur GmbH* Hans-Böckler-Str. 16 63263 Neu-Isenburg **Geschäftsführer:** Ahmet Yücedağ **Ver. Redakteur:** Özgür Reçberlik **politikart@yeniozgurpolitika.org**



# Raza Çiyê



◗ Li çiyayên Toros û Zagrosan zarokên agir û rojê mîna li hin deverên din ên cîhanê bi çiyê re nakevin rik û qayişê, bileks ji wan hez dikin, bi hesreta wan in û heta parçeyek ji wan in. Li gorî hev fesilîne û bi hev hene.

◗ Çiya zexm û qehîm in. Lê çiyayên herî asê û bilind di nava dilê zarokên agir û rojê de ne. Ji lewra ruhê azadî û serxwebûnê di dilê wan de her şax ber dide. Mîna dara berûyê ye, heta koka wê hebe ew naqele û her heye.

*Serê çiyan bi dûman e, berxê min*
*Birîn kûr in, bê derman e, bavê min,*
*Gelo çima ew hawa ne, megrî, megrî,*
*De menale megrî, megrî,*
*Ev çi hal e, megrî megrî,*



Rêşad SORGUL

Dema mirov li ser çiyan bifikire, bivênevê kela dilê mirov radibe, li derûnî û hinavan bayekî xemê yê neyê pênasekirin xwe ba dide û li stûna hestan dialîne. Yên li ser vê erdê, zarokên roj û agir in. Zarokên çiyê ne. Jiyana wan jî li gorî wê ye. Kinc û kirasên wan, mûzîq û awazên wan, deng û qîrîna wan, xwarin û vexwarina wan giş li gorî vê suriştê ye. Reng û lewnên wan li gorî vê diedilin. Xewn û xeyalên wan, çîrok û çîvanokên wan bi vê têne hûnandin. Mîna şembelîkên bi tîrêjên tavika buharê re hêdî dihelin, welê dinisilin hinav û cergan. Ma ne, Seîdê Kurdî jî di venêrtina bijîşkî de xwestibû ew li gorî erdnîgariya Kurdistanê û çanda wê were pênasekirin. Belkî ji wê bû, dema derdiket ser darê û mitale dikir, ji wê xisleta wî bû ku ew jî dereng pê hesiyabû.

Serê çiyan dûmanê digirin. Mij û moran dike ku em bi pey raza wan bikevin. Nepenî û nehenî sernuxûmî ne. Dilê me her dixwaze xwe dirêj bike û keşif bike. Lema raz tilsima jînê ye. Roj û agir di newalên kûr de vê sêhra tilismkirî har dikin. Ew li dora wê dizîvirin. Zemên weke hevîrekî qayişokî distirên. Ne salwext misêwa wilo ye.

Çiya û koh çawa ku xormal in, di heman demê de ateşgede ne. Hemin ew in, me dikişînin nava xwe û kengî em dikevin navê, diyar nîne kî ji kê ye. Nazir û menzûr, heq û heqîqet, abid û mabûd, dil û dilber dibin yek. Û carna mîna Baba Tahir gotî, nikare herduyan ji hev derxe. Belkî ji hev derdixe, lê dîsa fena Omer Xeyamî gotî, ditirse perde rabe, ne ew bimîne û ne jî yar.

## Kurd ji çiyê hez dikin

Pîrên li dora agir lêvên wan dilebitîn û li ser paşerojê diponijîn, himhim bi wan diket bi avzûn û hestên parzûnkirî cîhana hizirînê ya qewmê çiyê avdan. Ji wê ye, bandoreke wan a xurt li ser dîn û olên cîhanê hemûyan heye.

Çiya bang li me dikin. Dengê wan di hinavên me de olan dide. Dema bang dike û piçekî sura dengê wî digihîje me, ruh û rewanê me yê razayî hişyar dibe, xwe lê digire û diçe. Bang li me dike û di rojinga dilê me re xwe bera binê bîra me dide. Zarokên agir û rojê li ku dibin bila bibin hişyar dike.

Li çiyayên Toros (Tor) û Zagrosan (Zêya Mezin) zarokên agir û rojê mîna li hin deverên din ên cîhanê bi çiyê re nakevin rik û qayişê, bileks ji wan hez dikin, bi hesreta wan in û heta parçeyek ji wan in. Li gorî hev fesilîne û bi hev hene. Belkî ji vê be, ne ji dijminan be, Kurdan gotibe "Ji bilî çiyan dostê Kurdan tinene." Ji ber ku çiyayî ne ango ji çiyê ne.

Em di strana xwe ya li jor de jî dibînin, dengbêj, gilî û gazinên xwe ji çiyê re dibêje. Lê wexta qal dike ku "serê çiyê bi dûman e" û dema dibêje, "megrî megrî" fena ku bibêje, xema nexwe çiya bi hemdê xwe ne, weke her car qerase ne, asê ne, rê nadin û fikaran neke. Lê nizanim çima wexta dibêje, megrî berxê min, li pey wê megrî bavê min lê nayê û belkî jî diviyabû megrî dayê bûya.

## Çiya bi hemdê xwe ne

Çiya zexm û qehîm in. Lê çiyayên herî asê û bilind di nava dilê zarokên agir û rojê de ne. Ji lewra ruhê azadî û serxwebûnê di dilê wan de her şax ber dide. Mîna dara berûyê ye, heta koka wê hebe ew naqele û her heye.

Hesen Seba serketî bû û ev ne ji kelha wî ya qehîm bû, ji mejiyê wî yê bi azadiya çiyê avdayî bû û bi dilê wî yê asê bû, kes nikarîbû pê de biçûya. Ez ê nebêjim li ser sir û raza jînê bi temamî serwext bû, lê ez dikarim bibêjim ew şopgerên baş ê razê bûn. Zarokên rastî yê çiyê bûn. Li qanûnên rohnî û agir serwext bûn. Bi qasî bazekî têkoşer û bi qasî pinpinîkekê jî evîndarê jînê bûn. Ew şagirtên peristgeha çiyê, ilimdarê agir û rojê bûn. Û ew li keviyên van çiyayan bi firrê dikevin. Ji serê zinarên bilind, ji kendalan xwe bera xwar didin. Li hêliya dil yek û didu dibin yek, bi dahola dil re aqil tê cengê û ber dide hefsarê nefsê.

Çiya bang li me dikin. Weke Melayê Batê gotî, "qiblegeha aşiqanî" û fena heciyan karwan li ser rêkê ne. Ebceda eşqê li wir e. Eger me pirtûkeke eşqê bivê tije hub û evîn, biqulibînî newal bi newal, dol bi dol rûpelên wê; vexwe ji Kaniya Qestelê ava gulan, bireşîne misk û emberê, hingê tu wê perwaz bidî û bi firrê bikevî.

# Hez bike ji wî çiyayê tu di kaşê wî de westiyayî

◗ Çiya ne bi tenê cihekî bilind e, çandeke resen û dewlemend e. Lê her çand berî her tiştî ya erdê xwe ye, ya wê deverê ye lê çêbûye, paşê ya tevahiya gerdûnê ye. Serdest û mêhtingeran her tim xwestine çandê ji awayê wê yê xwezayî qut bikin û naveroka wê piçûk bikin.





Ferda ÇETÎN

*"Wey lê Dînê çiya bilind e*
*Te nabînim te nabînim*
*Wa qurbanê gul sor bûne,*
*Naçirpînim naçirpînim"*

Çiya...

Bi Ârâmî "tûr", bi Ibrî "hâr", û bi Erebî jê re "cebel" tê gotin.

Di klamên me de ew in, ketine navberê û rê nadin, gazin ji wan tê kirin, sedema hesretê ne, û lema ji bo wan tê gotin, bila xira bibin û hilweşin.

Dikevin navbera aşiqan, bi hesret û xurbetê navê wan têne hildan, hesreta dê, bav û ewladan zêde dikin. Mîna ew ketibin navberê û sedema firqetê bin.

Di her dem û dewranê de, di her rojgarê de, li dijî desthilata zordar û zordestan, ew bûne penageh û dost ji bo bindestan, ji bo dozdarên heq û heqîqetê.

Çiya ew penayên ezelî û ebedî ne, kesên li ber xwe dane û serî rakirine, bi awayekî bi xwe bawer ji bo wan gotine, "Eger ferman a padîşah e, çiya jî yên me ne."

Du kevalên ji kevir ên Xwedê bi xwe nivîsîn li çiyayê Tûrî Sîna pêşkêşî Hz. Mûsa kir.

Li Çiyayê Hîra´yê wehiya pêşî ji bo Hz. Muhammed hat şandin.

Li gorî Tewratê keştiya Hz. Nûh li serê Çiyayê Aratê (Agirî), li gorî Quranê li Çiyayê Cûdî rawestiyaye.

Li lûtkeyên Olîmpûs li nava ewran hê jî xwedayên Yewnan dijîn.

## Her çiya li bejna gelê xwe tê

Çiyayê Kaîlasê çiyayê xwedayan e, û ji aliyê Bûdîzm, Hîndûîzm, Jaînîzm û gelek dînên din ve pîroz tê qebûlkirin. Xwedayê Hîndûyan Şîva tevî hevjîna xwe Parvatî li serê Çiyayê Kaîlasê medîtasyonê dikin û rûniştî ne.

Li gorî Japonan xwedayên mezin hemû li serê Çiyayê Fûjî yê 3.766 metroyan bilind tên cem hev. Lê her 300 salî carekê pev diçin, şer dikin û di vê cenga wan de teqînên erd û ezmanan dihejînin, rû didin.

Di nava van çiyayan de yê herî bê şens, bêguman Çiyayê Everestê ye, û bi bilindahiya xwe ya 8.848 metroyan li navbera Çîn û Nepalê cih digire. Navê wî yê resen ê ji erdên xwe yên xas û qedîm girtiye, ji alî mêhtingeran ve hatiye guhertin. Bi demê re navê wî yê rastî hatiye jibîrkirin, navê wî yê sexte weke rastî hatiye qebûlkirin.

Kesê nav li Everestê kiriye mudîrê giştî yê kadastro yê rêveberiya mêhtingeh ê Ingilistanê li Hindistanê Georg Everest e. Em ê paşê li vê mijara desteserkirina mezin a gerdûnî vegerin.

Çiyayên mîna Vezuvê jî xwedayên xezebê bi rê ve dibin. Pompei li Başûrê Îtalyayê ye, bajarekî bazirganiyê ye û di nava dewlemendiyeke mezin de ye. Li gorî rîwayetê li bajarê çar nikarên wî kerxane ne, bê exlaqî û bê edebî asayî bûye. Timî dixwazin bitamijin, ji bo vê jî piştî ku têr dixwin bi perîkên qazan mahdê xwe dixelînin vedirîşin û dîsa dixwin. Çiyayê Vezuvê 23´ê Tebaxa 79 P.Z. diteqe û Pompei "bajarê bê exlaqiyê" ji nexşeyê radike. Ji vê felaketa mezin kes sax nefilitî. 16 hezar şêniyên Pompei bi temamî bûn kevir.

Wekî din li Efrîkayê çiyayê Klîmanjaro heye. Di warê nav de jî dişibe çiyayê Kurê Jaro yê li bakurê navçeya Şêladizê. Ev çiyayê herî bilind û serê wî bi berf ê Efrîkayê ji bo romana Ernest Hemîngway a bi navê "Berfa Klîmanjaro" bûye îlham. Heyranî û matmayîna nivîskar ne ji ezameta çiyê ye, bala wî tiştekî din dikişîne; "Pilingek çawa derketiye serê Klîmanjaro yê 6500 metro. Hestiyê pilingê qefilî li cihekî bilind ê çiyê hat dîtin û kes li vê serwext nabe."

Heywan û balindeyên nêzî ewran difirin û ji jêr û beriyê hez nakin, esaleta xwe û çiyê digihînin hev. Piling ji ber vê derketiye serê çiyayê Klîmanjaro.

Eger hûn xwe bi qûntara çiyê ve bigirin, hingê divê hûn qîma xwe bi tenêtiyê bînin.

Helbestnûsê hê nû bi ziman ketiye, gotiye, "Min li qûntara çiyayê 3 hezar metro bilind dareke guwîjê ya gelek guwîjgirtî dît ku li bendê bû hinek keviran biavêjinê."

## Mirov dernakeve çiyê, hildikişê

Dema hûn derkevin serê çiyê, hûn dikarin pê re li hev bikin. Kengî we pê re li hev kir wê bi we re ya nava dilê xwe bide der. Dema xwêdana we bi sura bayê hênik zuha kir, tîrêjên rojê yê pêşî beriya kesî gihand we, hûnê mehdera dayiyekê his bikin.

Li deverên çiya tinene, mirov xwe ji bo nêzî Xwedê his bikin û vê pêdiviya xwe bi cih bînin, gelek birc ava kirine. Pîramîdên Misrê, Birca Babîlê, Zîguratên li Mezopotamyayê û Pîramîdên bi navê "Teocallî" yên li Meksîkayê encama vê pêdiviyê ne.

Kesên gotine, "Rêya tu di kaşê wê de westiyayî jê hez bike" rast gotine. Eger tu bi meşê derkeve serê çiyayekî ew çiya çiya nîne gir e. Mirov dernakeve çiyê, mirov hildikişe çiyê. Hilkişîn jî zehmet e. Mirov dihilkume, diweste, diçerixe, dişemite û dikeve. Hûn ji jêr ber bi jor ve diçin.

Eger hûn dixwazin nêzî Erş-î Ala bibin divê hûn xwe xwar bikin. Eger armanca we xwegihandina huzûrê be, eger miradê we xwenêzkirina roj, heyv û ewran be, divê hûn xwe li zehmetiyê ragirin û di huzûrê de qusûrê nekin. Hûn ê xwe ber bi çiyê ve xwar bikin û li serê lingê xwe binêrin. →







◗ Heywan û balindeyên nêzî ewran difirin û ji jêr û beriyê hez nakin, esaleta xwe û çiyê digihînin hev. Piling ji ber vê derketiye serê çiyayê Klîmanjaro. Eger hûn xwe bi qûntara çiyê ve bigirin, hingê divê hûn qîma xwe bi tenêtiyê bînin.

◗ Ma ne çiya û koh ne tenê cihekî bilind ê cografîk e. Çiya jî navekî xwe, nasnameyeke xwe, kesayet, rewan û esaleteke xwe heye. Çiya bi xweza, dar û ber, ruhber, heywan û mirovên dewrûbera xwe çandek e.

Qanûneke girîng a çiyê ye: Çiyayê tu nikaribî jê bibihurî nikarî jê re tiştekî bibêjî. Eger merama we gotûbêjî û derdbêjî be, nabe hûn li qûntarê bimînin divê hûn derkevin serî!

Dibêjin "Çiyayê xuya dike pişta wî nêz e" lê qet ji vê bawer nekin. Dema hûn ji jêr ve li jor binêrin, hûn dikarin bawer bikin ku hûn dikarin bi carekê derkevin jor, lê kengî taqet di çongên we de nema hingê hûn ê fêhm bikin ku xwegihandin ewqasî jî hêsan nîne.

Ya rastî, çiya sir û raz e, raz jî nayê gotin. Ji bo xwegihandina razê şert e, mirov bi nava çiyê ve bimeşe û derkeve serê wî.

Çiya ne bi tenê cihekî bilind e, çandeke resen û dewlemend e.

Lê her çand berî her tiştî ya erdê xwe ye, ya wê deverê ye lê çêbûye, paşê ya tevahiya gerdûnê ye. Serdest û mêhtingeran her tim xwestine çandê ji awayê wê yê xwezayî qut bikin û naveroka wê piçûk bikin. Ev her finasê wan bû. Ji ber ku ew ji bo berjewendiyên xwe dixwazin rastiyê bixesînin, belovajî û çeloxwarî bikin, bixin xizmeta cîhana xwe ya madî û manewî. Çiyayê herî bilind ê dinyayê yê li ser sînorê Tîbet û Nepalê jî para xwe ji vê girtiye.

Navê resen ê çiyê bi zimanê Tîbetî Çomolûngma ye. Heya sala 1953´an jî li dinyayê bi vî navî hat naskirin. Çiyagerê New Zelandî Edmund Hillary û alîkarê wî Nagmal Kangi 29´ê Gulana 1953´an gihiştin serê çiyê.

### Di nava raza çiyê de çîroka mêhtingeriyê

Li herêma çiyayê Çomolûngma xelkekî xwecihî bi navê Şerpayiyan heye. Şivanekî ji van xwecîhan bi navê Negmal Kangî heye. Ew bi dehan car derketiye serê çiyê. Edmund Hillary jî çiyagerekî New Zelandayî ye û bi saya vî şivanî derketiye serê çiyê. Negmal Kangî dema li qûntara Çomolungma (Everest) bizinên xwe çêrandiye, rêya di navbera serê çiyê û qûntara wî de ji bo avdana bizinên xwe bi kar aniye. Ango gelek caran, belkî çil caran derketiye serê çiyê û daketiye. Lê belê ji bo dîroka zanist û mêhtingeriya rojava (!) ma çi qîmeta derketineke wisa ya xwezayî heye?

Em niha dîsa li Zelanda Nû ya Edmund Hillary vegerin…

Li vî welatî xelkê xwecihî Maorî dimînin. Beriya ku Abel Tasman ê Hollandî di sala 1642´an de vir keşif bike, di zimanê Maoriyan de jê re Aotearoaya digotin. Maneya wê jî "Welatê Ewrên Spî" ye. Hollandiyan çawa gav avêtin vî welatî bi vê keşfa mêhtingeriyê ya navguhertinê dest pê kirin. Bêyî bipirsin an jî lê bifikirin ka xelkê xwecihî çi difikire ev navê Zeeland munasib dîtine. Zeeland navê devereke li Hollandayê ye. Maneya wê jî "herêma deryayî" ye.

Ev welat mêhtingeha Ingilistanê ye û roja me ya îro jî girêdayî qralîçeya Ingilistanê Elîzabethê ye. Ha Edmun Hillary jî endamê vî welatî ye. Di sala 1953´an de derket serê çiyayê Çomolûngmayê û ev qaşo serketina wî, heman salê di merasîma tacgirtina Elîzabetha 2. de bi nîşana dewletê hat xelatkirin. Ev "keşfa" mêtingeh û bi dizî piştî 12 salan bi navguhertinê kirin mayînde.

Tevî nerazîbûnan gişan jî dewleta Ingilistanê sala 1865 navê Çomolûngmayê guhert. Navê mudîrê giştî yê kadastroyê yê rêveberiya mêhtingeh ê Hindistanê George Everest li şûna navê bi sedsalan dihat bikaranî danî. Bi vî awayî navê çiyayê herî bilind ê cîhanê guhertin û kirin Everest.

Ma ne çiya û koh ne tenê cihekî bilind ê cografîk e. Çiya jî navekî xwe, nasnameyeke xwe, kesayet, rewan û esaleteke xwe heye. Çiya bi xweza, dar û ber, ruhber, heywan û mirovên dewrûbera xwe çandek e.

Pîrejina helbestvan a herî bi temen a Ermenistanê Sîlva Gabudîkyan di hevpeyvîneke xwe de bi rojnamevanê Tirk re li ser pirsa "Çiyayê Araratê ji bo we Ermeniyan çi îfade dike" gotibû: "Ew, çiyayek e, her em nagihîjinê ew bêhtir bedew dibe. Mîna Fûjiyamayê Japonan Araratê me ye. Ararat ji bo we cihekî bilind e, ji bo me kûr e."

Ev têkilîdanîn û hûnandina Sîlva Gabudîkyan berevajî bûye. Êdî Ararat ne ew çiya ye ku mirov nikare bi nav de biçe. Belaya jê re dewlet tê gotin, ketiye navbera çiyê û Gabudîkyan û çiya kiriye mal û milk.

Gelo haya Xwedê jê heye, navê çiyayê herî mezin ê cîhanê yê wî afirandiye navê Çomolûngma hatiye guhertin û Çiyayê Araratê li Ermeniyan hatiye qedexekirin?

Qurana Kerîm di sûretê Neml ayetê 88´an de bi zimanekî zelal û vebirrî ber dilê me xweş dike;

"Hûn çiyan dibînin û dibêjin qey ew sekan in; lê ew jî mîna ewran tevdigerin. Ev hunerê ew Xwedayî ye, her tiştî bi rêkûpêk û tekûz çêdike. Bêguman Ew ji kirinên we bi temamî xeberdar e."



# Destana hemdem a Cûdî

◗ Çiyayê Cûdî piştî ku ji sefîneya Nebî Nûh re bûye cih û war, weke xaka dewama mirovahiyê hatiye qebûlkirin. Insanetî li Cûdî, li Mezopotamyayê ji nû ve esasên xwe danîne û belav bûye. Li gir û lûtkeyên Çiyayê Kurdan Cûdî, jiyanê ji nû ve dest pê kiriye.

▶ Dengir GUNES

Çiya di dîroka gelan de tim bûye sembola hêz û pîroziyê. Lê ji bo gelê Kurd tevî van taybetmendiyan, çiya berî her tiştî cihê starê ye. Weke çiyayên li Serhed, Botan, Dêrsim û Şingalê, di her tofana ku zaliman aniye serê wan de, çiya ji bo Kurdan bûne weke hembêza dayikê. Di her dema tengasiyê de çiyaya ew kesên pêdiviya wan bi alîkariyê çêbû, ji mirin û xirabiyan parastine. Eger heta îro jî em karibin destan û çîrokên li wan çiyayan bibihîzin, ev di heman demê de nîşan dide ku parastina van çiyayan ne dem kin e. Çiqas dem derbas bûbe jî, li wan gir û lûtkeyên xwe yên bilind nav û berxwedana wan egîd û lehengên li ser heqê û azadiya xwe jî parastine, xwedî li wan derketiye û nehiştiye ku werin jibîrkirin.

Ji Agirî heta Merato, Kato, Cûdî û Gabarê, hema hema her çiyayekî Kurdistanê bi destanên xwe tê zanîn. Lê belê Cûdî ku ji Gutîyan heta Babîl, Med, Bîzans, Artûkî û Mîrên Cizîrê şahidî li gelek şaristanî û hikûmdaran kiriye, di dîrokê de ji aliyê gelek neteweyan ve weke "Çiyayê Kurdan" hatiye binavkirin hem berê, hem jî îro bûye warê gelek destanan. Cûdî, ku bi bilindahiya zêdetirî 2100 metroyî, yek ji çiyayên herî bilind yên Mezopotamyayê ye, ji ber ku di pirtûkên dînî de jî behsa wî tê kirin, bûye çiyayekî bi nav û deng. Yên ku çîroka tofana Nebî Nûh, sefîneya Nûh ya ku piştî tofanê li Cudî daniye, nebihîstibin nînin.

Çîroka tofanê di mîtolojiyên gelên din, destana Gilgameş û di Tewratê de jî heye. Di Quranê de jî di sûreyên Hûd û Muimînûn de pêvajoya berî tofanê, gotinên Nûh û qewmê Nûh ku wî piçûk dibînin û li dijî wî derdikevin, bi berfirehî cîh digire. Li gorî ku di Quranê de dinivîse, ji ber ku qewmê Nûh ji rê derketiye Xweda weke ceza tofanekê tîne serê wan. Di encamê de tê gotin, Nûh berî tofanê sefîneya xwe çêdike. Xweda emir dike: "Cotek ji her cinsî zindî (nêr û mê) û ji bilî kesên ku berê derbarê wan de hikûm hatiye dayîn, malbata xwe û yên îman kirine li keştiya xwe siwar bike. (Sureya Hud/11/40) Nûh di dema tofanê de li sefîneyê dua dike û dibêje, "Xwedayo, min dayne cihekî pîroz." (Sureya Mu´mînûn, 23/29) Piştî vê duayê safîneya wî li Cûdî datîne: "Û av vekişiya, û kar çû serî. Û (keştiyê) li ser Cûdî danî." (Sûreya Hûd 11/44) "Ey Nûh, ji te û gelek ummetên bi te re, bi selam(başî) û bi bereketan (ji sefînê) dakeve."(Sureya Hûd 11/48).

Piştî sefîneyê li Cûdî daniye, Nûh û yên pê re li quntarên çiyayê Cûdî bi navê Heştan, (Semanîn) gundek ava kirine. Her çend di Quranê de hêjmara kesên ji tufanê rizgar bûne nehatibe diyarkirin jî, tê gotin ku ev hêjmar gelekî kêm e û weke navê ku li gund kirine an 8 (heşt) an jî 80 (heştê) ne. Gûndê Heştanê ji aliyê dewlata Tirk ve hate şewitandin lê bi xirbeyên xwe heta îro jî dimîne.

Çiyayê Cûdî piştî ku ji sefîneya Nebî Nûh re bûye cih û war, weke xaka dewama mirovahiyê hatiye qebûlkirin. Insanetî li Cûdî, li Mezopotamyayê ji nû ve esasên xwe danîne û belav bûye. Li gir û lûtkeyên Çiyayê Kurdan Cûdî, jiyanê ji nû ve dest pê kiriye.



Ev cihê sefîneyê ye, yanî cihê ku xelk bawer dike keştiya Nûh lê daniye.

## Lawikê Xerîb û Cûdiyê Miradan

Ji bilî vê destanê, di nav gel de çîroka Lawikê Xerîb jî tê zanîn. Tê gotin ku Lawikê Xerîb ji bo xwe bigihîne çiyayê Cûdî, cihê ku sefîneya Nebî Nûh lê daniye, bê navber heft salan çiya bi çiya meşiyaye. Dema nêzî cihê sefîneya Nebî Nûh dibe, dipirse bê ka rêya wî çiqas maye. Çend gavên wî mane ku xwe bigihîne, lê kesekî xirab Lawikê Xerîb dixapîne û jê re dibêje, "Ji bo tu xwe bigihînî cihê sefîneyê, divê hîna 7 salên din jî tu bimeşî." Dema vê bersivê dibihîze qeremê Lawikê Xerîb sist dibin, hêviya wî namîne. Paşê ji Xweda re dua dike û dibêje, "Êdî taqeta min nemaye, Xedawo canê min bistîne." Xweda daxwaza wî pêk tîne û canê wî distîne. Tê gotin, wê kêliyê, Lawikê Xerîb xwe gihandiye Xweda û hêviya wî ya azadiyê pêk hatiye.

Tevî ku Lawikê Xerîb bi saxî xwe negihandibe miradê xwe jî, Cûdî bûye "Cûdiyê Miradan". Berê gêlên Mezopotamyayê yên Xiristiyan, Êzîdî, Misilman û Yahûdî ku li vê herêmê diman, ji bo Nebî Nûh bi bîr bînin, di mehên Tirmeh û Îlonê de, li cihê sefîne kom dibûn. Ji bo hêvî û miradên xwe dua dikirin. Ji ber wê, ji Cûdî re digotin "Cûdiyê Miradan".

Lê Cûdî îro ji her demê zêdetir bûye warê mirad, hêvî û baweriyan. Gelê Kurd, bi têkoşîna xwe ya azadiyê weke dewama destana Cûdî, destaneke hemdem dinivîse. Ya rastî, bûyer, nav û cîh yek in: Dagirker bi zilm û hovîtiya xwe ya li ser van xakên pîroz dimeşînin ji insaniyetê dûr ketine, xweza, çand û baweriyan tine dikin. Li çiyayê Kurdan, li dijî tofana zilmkaran ji bo mafê gelê Kurd û hemû insaniyetê têkoşîneke heye. Cûdî ji heyama Nebî Nûh ve Cûdiyê Miradan e. Îro jî gelek Lawikên Xerîb, yên bi hesrate azadiyê li ser şopa vê insanetiye dimeşin.

## Destanên nû yên hêviyê ne

Lê belê di navberê de ferqek heye, ew jî gelekî girîng e, û dewama vê têkoşîna azadiyê pê ve girêdayî ye. Ev jî ew e ku ciwanên gelê Kurd êdî li van çiyayan tenê ji bo starê namînin. Evder kirine kelha berxwedanê û piştî têkoşîna azadiyê, dawiya çîroka Lawikê Xerîb guherandin. Rast e, Kurd ji bo bigihin armanca xwe ne 7 salan, lê têkoşîneke zêdetirî 40 salan dimeşînin, lê gelê Kurd ne doh ne jî îro weke Lawikê Xerîb, bê hêvî nema û li gotinên kesên xerab guhdarî nekir. Berovajî vê, li hemberî her pêla zilm û zordariyê berxwedan û lêgerîna xwe xurttir kir. Ji hêza xwe ya cewherî bawer kir. Ti carî ranewestiya û teslîm nebû. Weke Mahsûm Korkmaz (Egîd), Binevş Agal (Bêrîvan), Engîn Sîncer (Erdal) û heta Bedran Cûdî her kesê ku berê xwe da çiyayê Cûdî efsaneyeke nûjen nivîsand. Fermandar Egîd artêşa xwe li çiyayên Gabar û Cûdî mezin kir, destana artêşa azadiyê li wan çiyayan da destpêkirin. Bêrîvan bû pêşenga dema nû ya serhildanan, PKK li bajar û çiyayên Kurdistanê belav bû û êdî dem dema destana jinê bû. Fermandarê mezin Erdal, ji Ewrûpayê berê xwe dabû çiyayê Cûdî, pêşengî li destana nifşên nû yên Kurd kir. Derwêşê vê xaka pîroz Bedran Cûdî tevî 3 zarokên xwe di têkoşîna azadiyê de jiyana xwe ji dest da, destana ked, fedakarî û baweriyê nivîsand.

Bê guman weke her carê di destana nûjen ya Cûdî de jî dijmin hebûn. Bi dehan gundên Cûdî yên weke Heştanê ku ji gerîlla re hevaltî kiribûn, hatin şewitandin. Xelkê Cûdî dema koçber bû, tevî bibîranînên xwe, ev bihuşta xwe jî li pey xwe hişt. Tevî kirasên reng bi reng yên jinan, şal û şapikê mêran, duayên dayikan, kenê zarokan û hêvî ji di bin xirbeyên xaniyan de mabûn. Lê wan zanîbû ku keç û xortên wan yên gerîla wê xwedî lê derkevin. Gerîla ew çîrokên ku berê ji qirrkirina Zîlan û Dersîmê bihîstibûn, li gundên Cûdî zindî dîtin. Wê demê barê wan girantir, lê gavê wan xurttir bûn.

Şervanên nifşên nû ku li van çiyayan mîrasa têkoşînê dewr girtine, efsaneyên hemdem yên Cûdî ji hevalên xwe guhdarî kirin. Wan jî li ser van, çîrok û serpahatiyên xwe yên lehengiyê zêde kirin. Belkî ew çîrok îro ji ber dîwarên zilmê zêde nayên bihîstin, lê ew dîwar li ber heybeta Cûdî, ew zinarên wê yên bilind ma dikarin xwe bigirin? Cûdî ku weke mertalekî li sêkoşeya Bakur, Başûr û Rojavayê Kurdistanê bilind dibe, dikare ji tofana sedsalê jî biparêze û şahidî li destana yekîti û azadiya gelê Kurd jî bike.



Gotina gelek efsaneyan bi rîtuelên dema van zêwan ve girêdayî ne. Ji ber wê, rabûna ji holê ya van zêw û mihrîcanan, hêdî hêdî rabûna ji holê ya mane û efsaneyên çiyayan û xasên wan jî îfade dike. Yanî heger ziyaretên nû û kevin ên xasên Cûdî zêw û mihrîcanên xwe ji dest bidin, ew ê efsane û maneyên xwe jî ji dest bide.



# Kurdan qîma xwe bi Nûh tenê neanî




Luqman GÛLDIVE

Ji bo ku bi wê rûmet û serfiraziya hewandina bijartî û xasên Xwedê bixemilin û serê xwe di nava çiyayan de bilind bikin, du çiyayan da ber hev, du çiyayên Kurdistanê. Li aliyekî bi heybeta xwe ya bi serê xwe, na wele bi heybeta xwe ya cot, Agirî û li aliyê din zincîreçiyayên Cûdî bi wê heybeta asêbûna xwe.

Li gorî kitêbên dînên Semawî, Xweda li evdên xwe hatibû xezebê. Tofanê dinya dabû ber xwe. Ji bilî wanên di keştiya Nûh de, ji qewlê pirraniya xelkê ve di sefîneya Nebî Nûh de kes hema hema nefilitî bû. Ez dibêjim hema hema, ji ber ku dilê Kurdan qebûl nekir ku Xwedê her kesî bi agirê gunehkaran bişewitîne. Wan kir ku xwedayê aleman li pîrejineke bi tena serê xwe li gundikekî dima, bê rehmê. Ez ê behsa serpêhatiya wê jî bikim, lê ez li qayîşkêşana Agirî û Cûdî vegerim. Ji bo ku keştiya Nebî Nûh li ser wan dayne, her ku tofanê av bilind kir, Agirî xwe bilind kiriye û Cûdî jî fireh û asê. Agirî gotiye ez bilindtir im, ez hêjatir im; Cûdî jî nav dixwe daye û gotiye, ez hêjatir im. Agirî her xwe bilind kiriye, serê xwe rakiriye da ku ji ewran bibuhure û Cûdî xwe mezin, zexm kiriye.

## Cûdî xwe ji sefîneyê re fireh kir

Yanî ev jî terada çiyayan bû, li hemberî hev nav dixwe didan, qebqebûya wan bû. Her cara navê yekî ji van çiyayan dibihîsim, ev qayişkêşan tê bîra min û awayê diya min behsa wê dikir: "Çiyayên li dewr û bera Cûdî, hemûyan xwe bilind dikir. Wî digot, ez ji te bilindtir im, û wî digot, na ez ji te bilindtir im." Dayika min Cûdî bi maneya dîtina naskirinê, nedîtine. Bi gotina wê, ji bavê xwe bihîstiye ev çîrok. Malbata wî jî piştî şikestina Simko Axa ji Urmiyê koçberî Gever, Şirnex û Kercosê bûne. Yanî ev behsa hanê muhtemelen bi vî rengî li Urmiyê jî heye. Axir çi Kercos û çi Urmiye, ji van herdu mekanan ku ji wan ve ne Cûdî û ne jî Agirî xuya dike, yê bi ser dikeve her Cûdî ye. Belkî hinek bibêjin sedem Quran e; lê mesîhiyên hawîrdorê jî bi heman rengî bawer dikin ku sefîneya Nebî Nûh li ser Cûdî daniye, di nav wan de jî çîrokên Kurmancî ji ber ku belav dibin, em nikarin ji hev derêxin ka kîjanî pêşî ev rûmeta mezin daye Cûdî.



## Kurdan Pîra xwe ji xezeba Xwedê xilas kir

Di Quranê de di ayeta çarê ya Sûreya Hûd de wiha dinivîse, "(Xwedê) got, wa erd ava xwe daqurtîne, û ya ezman ava xwe qut ke! Û av vekişiya, û kar çû serî. Û (keştiyê) li ser Cûdî danî." Yanî Quran navê Cûdî hildide û "sefîneyê" datîne ser.

Ha li wî çiyayê Cûdî, pîrejineke ne di sefîneyê de jî ji tofanê difilite li gorî gotinên xelkê Kurmanciyê. Çawa ku sefîne li wê şûna îro jê re sefîne tê gotin û heta demeke ne ji mêj jî ziyaret bû, danî, Nebî Nûh û bawermendên wî ji sefîneya xwe derketin. Dîtin ku gundikekî yek malî li wir heye û ji kuleka wê malê jî dû diçe. Gava çûn û li deriyê wê malê xistin, pîrejinekê derî li wan vekir. Diyar e ku di dinya kevin de her kes bi hev re bi Kurdi dipeyivî; pîrejin jî Nebî Nûh jî bi zimanê hev dizanin. Jixwe, nizanibin jî em ji tecrûbeya Tor û Botanê dizanin, her kes xwe fêrî Kurmancî dike; ma naxwe çima li cihê ku mirovahî gava diduyê diavêje jiyanê, Kurdî hebe. Axir Nebî Nûh ji pîrejina Kurd dipirse, "Ma van çend rojên bihurî tu bi tiştekî nehisiyayî?" Pîrejin jî wiha lê vedigerîne, "Wele yabo baranê xweş dikir. Sibehê gava çûm aliyê axurê, min dît binê çêleka min, a şil e. Min got sibhanela, gelo lehî rabûye. Lê na, tine. Ne tiştek ji mala min û ne jî tiştek bi axur û çêleka min nehatibû."

## Pîkurêş e, Pîr Kurêş e

Di efsaneya xwe de Kurd wisa pîrejina bê guneh ji xezeba Xwedê Teala xilas dikin. Lê Cûdî jî dikin ziyaret. Ziyareta Sefîneyê, gundê Heştan, Şehrê Nûh (Şirnex) tenê nîne ev ziyaret. Ji Bêrivanan (Binefş Agal) heta bi Wesfî Kiliç jî gelek pakrewan tenê jî nînin. Diyar e ku Cûdiyê Miradan ne tenê bi qayîşkêşana bi Agirî re ziyaret e. Ew cîranê Mava û Bagokan e, sînorê wê hicrika Pîkurêş in. Pîkurêş, sonda mezin e. Sonda şoreşeke ekolojîk a caran e. Yanî gava dapîra min bi "wî Pîkurêşê heft gelî tijî dar kirî" sond dixwar, meraqa min ne Cûdî bû, lê ew Pîkurêş bû ku di inzîwaya çiyayan de jî bû ziyareta xelkê, û bavê dapîra min kir "koçekê" ziyareta xwe. Niha li serpêhatiya Pîkurêş dipirsim. Ji koçektiya bavê dapîra min, û ji navê Pîkurêşî bi xwe diyar e, ew Kurd e; hem bi ziman û hem jî bi baweriya xwe. Lê çima 7 gelî tijî dar kirine û gelo ew ne Pîr Kurêş be?

Û heger wisa ye, Pîr Kurêş ê li Dêrsimê, li Amed û li Botan û Torê pîroz û ziyaret, gelo dikare çiyayan bigihîne hev? Gelo dikare wê qayîşkêşana çiyayan veguherîne tifaqa çiyayan? Yanî ma Pîr Kurêşê bavê (yan jî kalê) Dizgun Bavo* gelo dibe ku bi hicrika xwe di navbera Bagok û Cûdî de be, li wan deveran heft gelî tijî dar kiribin? Dapîra min hê bi bîr tîne, gava ku diketin hicrika Pîkurêşî, silav lê dikirin, dua û tewaf dikirin, ji bo derkevin jî ticarî pişta xwe nedidan mezelê Pîkurêş, paşpaşkî ji hicrikê derdiketin. Ti carî ew ev nav, ziyaret û çiya ji hev qut nayên bîra mirovî. Jixwe, nabe ku bên bîra mirovî: Li Hezexê, nêzî Gizrê, li Newala Bîrê her sal Zêwa Pîkurêş hebûye.

## Bîra kolektîf û rîtuel

Zêw, yanî mihrîcanên ji bo kesên "pîroz", yan jî xasên xwedê tên qebûlkirin, ji bo efsane û maneyên çiyayan li Kurdistanê, heyatî ne. Lewma ji bo bîra kolektîf a li ser efsane û maneyên van çiyayan ew meydana gotinê ye, holika civat û dîwanê ye. Gotina gelek efsaneyan bi rîtuelên dema van zêwan ve girêdayî ne. Ji ber wê, rabûna ji holê ya van zêw û mihrîcanan, hêdî hêdî rabûna ji holê ya mane û efsaneyên çiyayan û xasên wan jî îfade dike. Yanî heger ziyaretên nû û kevin ên xasên Cûdî zêw û mihrîcanên xwe ji dest bidin, ew ê efsane û maneyên xwe jî ji dest bide. Bi qasî kevinan, nûyên weke Binefş Agal jî dikarin bibin ziyaret li quntarên çiyayên Cûdî li Cizîra Botan. Hingê Agirî serê xwe bigihîne ezmanan jî, Cûdî wê serbilind û şanaz be weke caran.

* Li gorî Saltik ji kalên Dizgun Bava ye. Turabi Saltik. Alevilikte Ocaklar Gerçeği ve 4 Kapı 40 Makam Öğretisi: Alevi / Kızılbaş Katliamlarına Yönelik Ferman ve Fetvalar. Stenbol 2017. r. // Lê Dêrsimî bi giştî wî weke bavê Dizgun Bava dibînin. Binihêre li Dilşa Deniz. The Path: Dızgun Bawa, As an Example of Relation between Belief and Life Style. Di; Religious Inquiries, Berg 4, Hejmar 8, Kanûna 2015'an, rûpel 63-82.

# Di sê nifşên helbesta Kurdî de gotara çiya

- Taybetiya nifşê Hawarê ew e ku aktor û şahidên serhildanên berî û piştî nîveka sedsala 20'an in. Osman Sebrî yê ku digot "Kurd in em şêrên çiyan in" di kovara Hawarê de jî kesekî aktîv bû.

- Li gel Fêrîkê Ûsiv hebûna çiya bi serê xwe dibe coş û peroşa hestên wî, mirov dikare bibêje bona Fêrîk çiya ne eydê qewmekî ye, "non-ethnic" e. Ji helbestên epîk bêhtir bi helbestên pastoral 'tebyethiz'iya xwe dide kifşê.

- Di nav helbestvanê nifşê Tîrêjê de belkî herî zêde Arjen Arî "çiya" wekî "bîra neteweyî" bi kar anîye, çiya di heman demê de bûye bîr. Ew bîra hanê jî li gel wî digel têkçûn û şikestinên kambax jî "rûspî ne".

- Piştî bipêşketine fikra neteweyî û şerê bi dewletên serdest re helbestvanên Kurd ji bo çiyayên Kurdisranê tenê bi motîfeke teswîrkirinê qîma xwe nayînin û êdî çiya dibe aktoreke berbiçav.



Îbrahîm BULAK

Di helbestên klasîk ên Kurdî de 'çiya' ne bi konteks û wateya neteweyî xwe dide der, bêhtir di konsteksta efsane û çîrokên dînî de derdikeve pêşmerî me wekî "Kohê Qaf", "Kohê Tûr". Her wiha di destpêka helbesta nûjen a Kurdî de jî ku ew jî teqabulî destpêka sedsala 20´an dike, hingî jî 'çiya' di teswîrkirina welêt de parçeyeki jê ye, zêde rola wî tine. Paşê, pêde pêde bi çêbûna hizra neteweyî Kurd jî wekî her miletekî din dawa heqê xwe yê neteweyî dikin, ew dawkirina Kurdan jî dibe şerê bi dewletên dagirker re. Hin ji wan li deşt û nav bajaran hin ji wan jî li çiyayan diqewimin. Her wiha piştî têkçûna van şeran çiya dibin şahidê komkujiyên mezin jî. Ji ber vê yekê heta dewra 1960´an jî çiyayên Kurdistanê bêhtir êş û kuştin dianîn bîra Kurdan. Lê li Başûrê Kurdistanê piştî bipêşketina Şoreşa Îlonê, paşê jî li Bakurê Kurdistanê bi teqîna guleya 15´ê Tebaxê re jî êdî çiya ji nû ve dibin meydanên liberxwedanê. Ji vê demê û şûn ve, êdî ew meydana liberxwedanê xwe bi şiklekî di helbestên Kurdî de jî dide der. Dixwazim di vê nivîsê de behs bikim bê ka di helbesta Kurmancî ya sê nifşan de çawa û bi çi şiklî qala çiya hatiye kirin. Em ê bibînin ku şairên van her sê nifşan; Hawar, Riya Teze digel ku zeman û mekanên cuda bûne jî boçûn û qîmeta li çiyan çawa nêzî hev bûne. Ew ê jî şanî me bide ku çiya di çêbûn û kemilîna neteweperweriya Kurdî de bi dewr û roleke diyarker rabûye. Her wiha ew helbestên hanê ku hinek ji wan digel ku ji hest û fikra takekesî peyde bûbin jî pirranî hestên komelî û diyarkirina xemeke kolektîf e ku xwe bi kirasê 'çiya' nîşan dane.

### Nifşê Hawarê û çiya

Kovara Hawar sala 1932'yan li Şamê dest bi weşana xwe kir, ji kovareke wêdetir bû xwendingeha Kurmancî û pê re jî navenda rewşenbiriya Kurdî. Taybetiya nifşê Hawarê ew e ku aktor û şahidên serhildanên berî û piştî nîveka sedsala 20'an in. Osman Sebrî yê ku digot "Kurd in em şêrên çiyan in" di kovara Hawarê de jî kesekî aktîv bû. Di nivîsa xwe ya 'Agirî' de wiha bang li çiyê dikir: "Çiyayo bizan, şerê xesala miletekî heye ko bisekine lê ew beriya xelasiya wî miletî naqede, dom dike… Pêş de diçe"

Çiya her çiqas bêdeng be jî hêviya wan heye ku rojekê dîsa dengê xwe li her derê belav bike. Cegerxwîn yeqîn dike ku helbet rojekê çiya ji bo ve wê geş bibe:

"Bîna barûdê
Kete pozê min
Dixwazim hawîr
Biteqim ji bin
Dîsa wek mêra bikevin çiya"


Jixwe piştî çend salan Qedrî Can mizginiya şiyarbûna çiyê dide:
" Dîsa li ser çiyan
Dîsa li nav meydan
Deng dike,
Ceng dike,
Berzanî… Berzanî…."

### Riya Teze û çiya

Di nifşê ewil ê Riya Teze de çiya bêhtir bi bedewbûn û ezameta xwe ya şirûştî xwe di helbestê de dida der. Emînê Evdalê yek ji şairên vî nifşî ye ku di helbestên wî de çiya hê politîze nebûye:
"Binhêr li çyaê Elegezê,
Çiqas rindin xişikêd wê."

Lê belê şairên nifşê duyem bi pirranî salên 60'î rahiştine qelemên xwe û hingî Şoreşa Îlonê jî li Başûr dest pê kiribû. Di helbestên Mîkaêlê Reşîd, Fêrîkê Ûsiv û Şikoyê Hesen de em ê bi meselê dakevin.

Li cem Mîkaêlê Reşîd çiyayên Kurdistanê ji bo Kurdan sitar in, bi kubariya xwe jî tekane ne:
"Û ç'yaê bilind boy min sitarin
Boy min mertalin pêşberî neyar,
Kuda jî herin, dinê bigerin,
Tu cîya nabînin ç'yaê ha kubar."





Dilê xwe jî daniye van çiyayan:

"Dilêm wire, li wan ç'ya,
Li wan cya,
Kîderê ku zeng û zinar
Bona kurda bûne sitar,"

Çiya parçeyekî nasnameya Kurdan e jî; herçî bixwaze Kurdan nas bike jî çiya rênîşander e:

"Tu zanî em kêne?
Em li ç'yê dimînin,
Nêzikî xudêne."

Her wiha Kurd hingî êşiyane û karesat jî ditine, encax ezamet û mezinahiya çiyayan dikare van terîf bike:

"Ji kul û derdê me
Nava dewr û qurna
Ev ç'ya xuliqîne."

Çiya cangoriyên welêt jî hewandiye di sînga xwe de, wan jî ji bîr nake:

"Ez dixwezim li wan ç'ya,
Li wan cya
Rokê rabim û bigerim,
Kîderê ku xûn bû, mirin,
Û ramûsim mezelê wan,"

Çiya wekî şahidê dem û dewrana xwe jî dizane:

"Û herkê rokê ç'ya gişk xeberdin,
Wê caba gelek pirsê me bidin,"

## 'Tebyethiz'î û dilketina Fêrîk

Li gel Fêrîkê Ûsiv hebûna çiya bi serê xwe dibe coş û peroşa hestên wî, mirov dikare bibêje bona Fêrîk çiya ne eydê qewmekî ye, "non-ethnic" e. Ji helbestên epîk bêhtir bi helbestên pastoral 'tebyethiz'iya xwe dide kifşê. Ewqas ji çiyê hez dike, bengiyê wî ye jê têr nabe:
"Dîsa-dîsa we têr nebûm, çiyano
Dîndara we zivêr nebûm, çiyano,"

Carna vî dike dewsa dê jî:
"Hûn dê bûbe, hûn dê bûne, ez-dergûş,
Li hafê we firîme wek qereqûş,"

Gava dibe payîz jî melûl dibe, jê dipirse:
"Çiyano, bêjin, ka nexşê we?
War-mikanê we kuda çûn?
Ax ez digirîm bo rewşê we,
Rewş-rihanê we kuda çûn?"

Lê li gel melûliya xwe hêviya xwe ji biharê nabire:
"Emê şîn bin, şên bin car din,
Bixemilin sal û zeman,"

Gava dibêje "Pampa min" jî çiyayên Dibûrdax, Qemerdax, Elegez, Hevtêmanat ji bîr nake:
"Pamp mîna bûka, bûka xeml lê bend,
Dorê çiyayêd me girtine govend"

"Deşt û dûz" zêde bala wî nakişîne, herçî xwe xwedan bi deşt û dûzan dibînin ji wan re jî çend gotinên wî hene:
"Bira deştê we li we bimbarek bin,
Xweyê deşt-dûza,
Bira çiyayêd me li me bimbarek bin,
Me tebiyethiza."

Fena ku wî pirsa wekî "ka çi kerametên van çiyayan hene tu li ser wan dinivisî" bibihîze, bersiva pirsê dide:
"Lê helbet me jî kar û keremek
Van çiyada dîtiye"

Lê xuya ye, ditîna çiyayên Kurdistanê jî ji xwe re kiriye derd û hesret :
"Min seyr kira serê çiyayê Sîpan-Xelat,
Min seh kira fûre-fûra çemê Ferat,
Min pê danya ser topraxa kulî tebyet.."

Belkî xwe bi çiyayên xwe dewlementirî kesê dinyayê jî dihesiband:
"Ezî dewletîme bê hed, bê hesab, bê çap û qeder,/
Xezîna min heye çelkirî serê çiyayê Qemer,"

Şikoyê Hesen jî Kurd wekî qewmekî çiyayî dizane û dibêje:
"Û ez bîr nakim eslê xweî çiyayî,
Tim mînanî çiya ez zor im, kubar"

## Kovara Tîrêj û çiya

Kovara Tîrêj di navbera salên 1979 û 1981'ê de tevî ku çar hejmarên wê tenê ronayî dîtine jî yek ji wan li Ewrûpayê çap bûbû, di helbesta Kurmancî û Kirmanckî de bû rengekî modern û neteweyî.

Di nav helbestvanê nifşê Tîrêjê de belkî herî zêde Arjen Arî "çiya" wekî "bîra neteweyî" bi kar anîye, çiya di heman demê de bûye bîr jî. Ew bîra hanê jî li gel wî digel ku têkçûn û şikestinên kambax jî ditîne, "rûspî ne":

"Di qada şer de pişta me negihişt erdê.
Te şahid bivê, va Herekol.
Miradkar, bi bext û ol
Va Cûdî
û va ye ev ax!"

Tu carî jî betal nemaye:

"Kîj wextî bêleheng ma?
Kî gavê bêkêr?"

Jixwe, nasnameya xwe jî ji çiyayan çêkiriye loma jî dibêje "ez Çiyayî Me" û pêwendiya xwe ya xurt a bi çiyan re jî wiha raberî me:

"Dema ku dinivîsim
bêhemdê min
çiya û dîmenên çiyê
têne ber çavê min.."

Yek ji şairên nifşê Tîrêj Mem Ronga jî qîmeteke mezin dida çiyayan û sedema xwe bi çend malikan wiha rave dike:

"min parastin ji mirinê
ragihandin îro
ev çiyayên ferzane
ev zinarên jîrik

çewa hiznekim ji wan
bi qasî ku hizdikim
ji azadiyê
ji axê"

Êdî çav û guhê Kurdan li çiya û zindanan bû, Rojen Barnas wek şahid na, wek rola çêkera tarîxa Kurdan jî dide wan:

"Bi mêrxasî destana xwe dihonin
Çi li zindanê, çi li serê çiyê'.'

Yek ji şairên vî nifşî Berken Bereh jî nav rûpelên kovara Tîrêjê bajar û kolan bi îmajeke ne baş û wekî mekana tolaziyê terîf dike, û her wiha ji bo jiyaneke nû jî çiya hêvî ye:

"bi şev bi roj
em evînek bihonin
evînek nû û mestir…

Lew
niha stran me dibêjin
stran li çiya."

## Li şûna encamê

Di helbesta nû ya Kurdî de ji bo xurtkirina hest û fikrên neteweyî teswîrkirina dîmenê welêt bêhtir nasyonalîzekirinê vê xwe dide der, êdî çiyayên vê jî ne çiyayek dera hanê ye, çiyayê Kurdan e, û rengê xwezeya vê jî fena rengên ala wê ye û xwedî nasnameyek e. Çawa me di sê ekol û nifşên cuda yên Kurmancî de dît, piştî bipêşketine fikra neteweyî û şerê bi dewletên serdest re helbestvanên Kurd ji bo çiyayên Kurdisranê tenê bi motîfeke teswîrkirinê qîma xwe nayînin û êdî çiya dibe aktoreke berbiçav. Çawa di dewra Hawarê de çiya bi şahidiyên xwe wekî aktorekê ye, di dewra Riya Teze û Tîrêjê de jî êdî aktoreke diyarker û zindî ye. Piştî van her sê nifş û ekolên helbestvanên Kurdî, çi li welêt çi li diyasporayê, çi klasîk çi modern şairan di helbestên xwe de cih da çiyayên Kurdistanê.

## Çavkanî:


Nerît û Helbest- Nerîta Neteweyî Di helbesta Nû ya Kurdî de (1880-1970), Zülküf Ergün, weşanxaneya Nûbihar, 2017
Payîz û Ba- Şi'rên Bijarte, Şikoyê Hesen, weşanxaneya Avesta, 2008
We'de-Pencere-Mitale, Mîkaêlê Reşîd, Weşanên Belkî,2019
Rêdame, Mîkaêlê Reşîd, Neşireta "Sovêtakan Grog", Êrêvan-1985
Hemû Berhemên Wî, Qedrî Can, weşanên Belkî, 2009
Pampa min-Berhemên bona zarokan, Fêrîkê Ûsiv, weşanxaneya Lîmûş, Êrêvan-2009
Dîvan, Melayê Cizîrî, Transkrîb û wergera Kurdî bo Tirkî: İlhami Sidar, weşanên Ayrıntı, 2018
Bijare, Fêrîkê Ûsiv, weşanxaneya Lêgal Pîyûs, Êrêvan.2010,
Destê min li destê te digere, Mem Ronga, weşanxaneya Mezopotamya, 1995
Kîme ez-Dîwana III, Cigerxwîn, 1973
Şiêran û Poêman, Emînê Evdal, weşanxaneya Belkî, 2015
Milkê Evînê, Rojen Barnas, weşanên Nûdem, 1995
Kovara Tîrêj, Hejmar 2, 1980
Kovara Hawar, Hejmar 36, 1941
http://helbestakurdi.com

# Li Cûdiyê şervanekî ciwan

◗ Ji min re gotibû, "Bihar ji aliyê başûr ve tê Cûdiyê. Kurdiya Cûdiyê weke ya li herêmên din ên Kurdistanê nîne. Ew cuda diaxivin. Gotinê wan hene li cihekî din tinene. Li cem me navê her tiştî heye."

◗ Ev ciwanê ku min wî 20 sal berê weke şervanekî ciwan di demsaleke havînê de dîtî, li çiyayê Cûdî yê xwedî gelek efsane û destanan, di havîneke din a germ de heta guleya xwe ya dawî şer kir û şehîd bû.


İsmet KAYHAN

Rûtirşî bû, mahdê xwe kiribû, cixara xwe ya nû vêxistibû bi hêrs avêt erdê. Qelşa di texma birûyê xwe de nîşan da û got, ev bîranîn ya dema mirinê ye. Mezlûm esmer bû û li ser rûyê wî çavên wî yên mezin gulover hebûn. Piştî rêwîtiyeke dûrûdirêj û zehmet gihiştibû Şamê. Ev militanê ciwan ê ji Botanê hatibû 19 salî yan hebû yan tinebû. Lê bêhtir bi temen xuya dikir. Gotin di cih de be, hinekî kal bûbû û rûyê wî hilhilî bû...

Tarî ketibû erdê, dîmenê dinyayê yê xuya dikir mîna mezin û fireh bûbû. Girên Golanê li pêşberî me bûn. Ji dûr ve dengê Feyrûzê dihat û me lê guhdarî dikir. Min ji Şîrhat pirsî ka ev deng ji ku tê. Wî jî got, hinekî wir de meyxaneyek heye ji wir tê. Lê min kakûnî û meraqa meyxaneyê nedikir, min Mezlûm meraq dikir. Min ji Şîrhat pirsî ka Mezlûm çima bi kesî re napeyive û wî jî got, "Ew heta gihişt vir, wî gelekî şer dît. Di nava operasyonê de ma. Ew kesekî welê ye, qebristanên wî di nava wî de ne." Şîrhat ji Çewlîkê bû û hinekî asî û serhildêr bû. Mezlûm jî ji bilî Şîrhat zêde bi kesî re nedipeyivî.

## Niqutî dilê min

Min dixwest ez li çîrok û serhatiya Mezlûm guhdarî bikim. Min dixwest ez wê kêliya mirinê hîn bibim. Lê awirên wî yên wisa xumamî hebûn, mîna bibêjin, zêde bi pey nekeve. Cixare ji cixareyê vêdixist. Xet û xalên rûyê wî dijwar bûn. Mirov digot qey bi sewdayeke çavkorî ye. Mîna ku dixwest tiştekî bibêje hinekî kelimî, bêhnekê sekinî û destpê kir qal kir.

Tîrmeh bû. Dinya germ bû û wexmeke giran hebû. Niqutî dilê min wê şevê tiştek wê biqewiya. Bêdengiyeke giran xwe li her deverê alandibû. Di demekê de ku tarî diket erdê, eskerên Tirk bi ser gundê me de girtin. Berê jî gelek caran hatibûn, lê vê carê pirr dikirin qîreqîr û warewar. Dinya pirr germ bû. Ji aliyê başûr ve toz û dûman dihat. Di nava vê tozê de zilamên gund li meydanê kom kirin. Min ji dûr ve li wan temaşe dikir... Mezlûm nikarîbû dewam bike. Gotin di qirika wî de asê bûn. Awirek da min û xwest ez ji ser serê wî biçim... bêdeng bû... êşeke hûrûkûr di rûyê wî de xwe da der. Mezlûm ketibû nava gelek şeran û sax derketibû. Carinan diket kirasekî welê, mirov digot qey nîvmirî ye... paşê dîsa dewam kir û gotin teqilandin... kalê min di serhildaneke li dijî eskerên Tirk li Cûdî de hat kuştin. Hespê wî yê reş tenê li ser mabû. Rojeke havînê ye, rasterast bi ser dijmin de diçe; bi guleyan mîna seradê wî kunkunî dikin. Dê, bav, xuşk û birayên min bi qasî wî ne bi şens bûn. Wan di bombardumaneke artêşa Tirk de can da.

## Navê her tiştî li Cûdî heye

Dema min zilma eskerên Tirk dît, ez çar pênc salî bûm. Bavê min ji min re qala Cûdî dikir. Digot çiyayê Cûdî bi avzûn e, û hêzeke wî ya nayê fêhmkirin, heye. Bavê min mirovekî şerker bû, min jî ji ber vê serî hilda. Lê min guh da şîretên wî û hemû bi cih anîn. Hafizeyeke wî ya xurt hebû. Tarîxa Cûdî hemû dizanîbû. Ji min re gotibû, "Bihar ji aliyê başûr ve tê Cûdiyê. Kurdiya Cûdiyê weke ya li herêmên din ên Kurdistanê nîne. Ew cuda diaxivin. Gotinê wan hene li cihekî din tinene. Li cem me navê her tiştî heye."

Bavê min rojekê ez biribûm bajêr. Ez zarok bûm. Li bajêr her kes zimanekî xwe hebû. Ez matmayî bûm û bi kelecan bûm. Min xwe bi xwe gotibû, bi herhalî em ji ber vê ji hev fêhm nakin. Mirovên Cûdiyê mirovên serwext in, giş çend bavikên xwe nas dikin. Pêşiyên me jî bi şer mezin bûn. Ji lewra gelek bûyer û serhatî di mejiyê me de ketine ser hev. Weke bîr an jî kewareke derd û kulan in. Yanî ez dibêjim, ez jî bîr û hafizayeke pêşiyên me me. Eger bavê min di bombardumanê de nehatiba kuştin, Xwedê zane wê di bin barê wî mejî û hafiza xwe de bimirana.

Divê tu ji bo Cûdî şer bikî Ez dema li wan difikirim, ez ji xwe re dibêjim, divê tu ji bo Cûdiyê şer bikî. Mirin her tim weke bayekî tofanê li nava malbata min rabûye. Lewma mirin xeternak bû. Bi mirina min wê reh û kokek biqele, tine bibe. Mirin her tim dikare bê. Belkî mirin tiştekî ewqas ne xirab be. Mezlûm wisa got û ket xewê.

Rêya min û rêya Mezlûm ê bi şev li quncikeke xewle li Quranê guhdarî dikir yek bû, lê berê me li aliyê cuda bûn. Ev ciwanê ku min wî 20 sal berê weke şervanekî ciwan di demsaleke havînê de dîtî, li çiyayê Cûdî yê xwedî gelek efsane û destanan, di havîneke din a germ de heta guleya xwe ya dawî şer kir û şehîd bû.



# Destana Hemdem e Çiyayê Kizwanan







◗ Çeteyên DAIŞ´ê piştî berxwedaneke 133 rojan ji Kobanê hatibûn derxistin, ji xwe beriya wê, li Şingalê hêzên Kurdan pêşî li komkujiyê girtibûn; ji Tebaxa 2014´an heta serê meha Gulanê di kîjan bereyê de bi Kurdan re şer kirin, li wir şikestin. Lewma şerê vê herêmê wê şerekî dîrokî bûya, wê çarenûsa herêmê diyar bikira.

◗ Piştî şerê pirr dijwar ê 15 rojan Çiyayê Kizwanan gihişt miradê xwe. Dara Miradan a li serê Çiyayê Kizwanan dîsa bi reng û xemla dîrokî hat xemilandin. Û ji wê rojê ve nobetdarên azadiyê agirên serê çiya geş dikin.

▶ **Sînan CÛDÎ**

Di hemû ol û baweriyan de; mîtolojî ango di destanên xuluqandinan de pîrozbûn bi bilindbûnê ve hatiyê pênasekirin. Azadî, bihûşt, xweda û xwedawendan tim li asîmanan peyda bûn. Şînbûna asîman lewma bû nîşaneya aso, hêvî û rizgariyê.

Her kî li nêzî asîmanan ba ewê pîroz ba. Roj, hêyv, stêrk û gerestêrka; ba, baran, brûsk, berf û bahozan tim bûn nîşaneya ezameta mirov, gel, civak ango fikran.

Dem û dewran guherî û ev hiş ji xwe re du fikrên esasî ava kir. Her çiqas dijberî hev bana jî her duyan jî bilindahî ji bo xwe kir armanc. Yekî ji bo şûştina mêjiyan û meşrûkirina desthilatdariyê, yê din ji bo li hemberî wî têbikoşê lûtke ji xwe re kirin welat. Yekî ji bo bindestkirin, yekî ji bo rizgarkirin li heman cihan bîryargeh danî.

Lewma her kî ji xwe re hêz geriya xwe bi bilindahiyan ve girt. Her kî serê wî ket belayê ji bilindahiyan eman geriya.

Ma ne Nebî Nûh ji bo jiyana nû xwe li Cûdî girt.

Hêvî û baweriya hemû mirovên bawermend tebeqa 7´an a bihûştê ye, zanistên hemdem jîngeha nû li fezayê digere.

Hemû xweda û xwedawendên pîroz taxtên xwe li Çiyayên Kurdistanê datînin.

Lewma Kurdan jî ji Zerdeşt heta Kawayê Hesinkar, ji Selahadînê Eyûbî heta Şervanên Azadiyê tim xwe diavêjin hembeza çiya.

Çiya dibe pêsîr, palpişt, hêlîn; dibe av û xwarin; dibe azadî û rûmet. Çiyayê Kizwanan jî yek ji wan çiyayan bû.

## Çiyayê Kizwanan

Cewiyê Şingalê ye Kezwan. Her du jî sewî ma ne di nivî deştê de. Ji çiyayên Toros û Zaxrosan qut ma ne. Wekî nobedarên di nivê deştê de, wekî rawestgehên dawî yê Kurdistanê ne. Derî ne, sînor in, nîşane ne. Wekî du milên ji bedenekê ne. Yek jê ber bi rojava ve dixwaze xwe bigihîne Dicle, yek jê ber bi rojhilat ve dixwaze xwe bigihîne Firat. Wekî du keleh û sûrên parastinê ne.

Çiyayê Kizwanan ango bi navê xwe yê din Çiyayê Evdilezîz ji çanda Girê (Til) Xelef a 6 hezar sal Beriya Mîladê ve cih û warên Kurdan e. Geh ji bo parastina çanda Kurdî geh ji bo parastina Îslamê geh ji bo parastina eşîran wekî stargeh hat bikaranîn. Û heta niha jî di parastina Rojavayê Kurdistanê de cihekî stratejîk e. Lewma bi qasî ji bo Kurdan ji bo dijminên Kurdan jî girîng bû.

Sala 2014´an, dema DAIŞ´ê çav berda herêmên Kurdan, biryargehên xwe li vî çiyayê danî. 3 baregehên herî mezin a DAIŞ´ê ya li Sûrî, li vê herêmê bû. Cihê perwerdekirin, navenda tenduristî û biryargeha operasyonan a DAIŞ´iyan li quntarê çiyê bû. Mexlûca ya ku di quntara bakur a çiyê de bû ji ber daristanên mezin, stargeheke guncaw bû. Çiya, 35 kîlometroyan li başûrûrojavayê Hesekê ye û ber bi rojhilat ve tevî rêzeçiyayên xwe heta ber bi Eyn Îsa ve jî diçe.

Çem û geliyê Xabûrê ji Til Xelef ber bi başûr ve heta serê rojhilat a çiya dirêj dibe. Li derdora vî çemî gundên gelê Asûrî û Sûryaniyan heye. Piştî serketina Kobanê, dema şervanên YPG û YPJ´ê, di zivistana 2015´an de berê xwe dan yek ji biryargeha herî girîng a DAIŞ´iyan a li Til Hemisê; çeteyên li Kizwanan van gundan kirin hedef û 23´ê Sibatê de heta Til Temirê hemû herêmên li rojhilatê çem xistin di bin dagirkeriyê xwe de. Bi vî awayî ji gundên Mebrûka, Dehma û Rawya yên li ser sînorê bakur in, heta bajara Heseke hemû herêm ket bin serweriya DAIŞ´iyan.

Ji sînor heta Til Temirê, mintiqa gelê Ereb, ji Til Temir heta Hasekê zêdetir herêmên Asûrî-Sûryaniyan, li derdora çiya û rojavayê çemê Xaburê jî mintiqa Kurdan bû. Gotin di cih de be hemû gelên herêmê xwe li van erdên bi bereket û kevnar girtibûn. Lewma DAIŞ´iyan ihtîmameke mezin didan vê herêmê. Li gorî wan, serketina di vî warî de wê bibûya serketina sîstema DAIŞ´ê. Li ser rengîniya herêmê wê ala reş û tarî serwer bibûya.

## Çanda Gelan bi ser dikeve

Lê belê gelên herêmê ji zû ve li hember yekrengîbûnê li ber xwe didan. Di nava pirçandî û pirzimanîbûnê de, li gorî rêûresma gelên xwe jiyane. Ne zilma Osmaniyan, ne zilma Baesiyan erê nekirin û tim di nava hevgirtinê de bûn. Lewma piştî Şoreşa Rojava, dilsoziya xwe bi armancên rêveberiya xweser re raber kirin.

Ev êriş di heman demê de tolstandineke li hember vê helwêstê bû jî.

DAIŞ´iyan amadekariyên xwe temam kiribûn da ku derbasî rojhilatê çêm bin, ji başûr, rojhilat û rojava ve êrişî Hesekê dikirin. Ber bi Serêkaniyê ve rojane êriş hebûn.

Di rojên qedere de bûn, an wê ala reş an wê ala zer li ser serê vê herêmê hatiba hildan.

Çeteyên DAIŞ´ê piştî berxwedaneke 133 rojan ji Kobanê hatibûn derxistin, li Til Hemisê derbeke giran a dîrokî xwaribûn, ji xwe beriya wê, li Şingalê hêzên Kurdan pêşî li komkujiyê girtibûn; ji Tebaxa 2014´an heta serê meha Gulanê di kîjan bereyê de bi Kurdan re şer kirin, li wir şikestin. Lewma şerê vê herêmê wê şerekî dîrokî bûya, wê çarenûsa herêmê diyar bikira.

Şervanan jî xwe li gorî vê amade dikir; li gorî çanda dîrokî tevdigeriyan. Ew bi erkên dîrokî radibûn.

Lewma Hemleya Rizgarkirina Çiyayê Kizwanan di rojeke dîrokî de hat ragihandin; 6´ê Gulanê.

## 6'ê Gulanê çi qewimîbû?

Rewşenbîrên Ereb ku nûnertiya Erebên di bin serweriya Osmaniyan da dikirin, xwe bi navê Hizbu'l-Lamerkeziyye el-Îdariyye el-Osmanî rêxistin kiribûn; armanca wan jî ji bo hemû gelên herêmê avakirina rêveberiyên xweser bû. Yek je damezrînerê vê rêxistinê, Îskender Ammun di axaftineke xwe de armancên xwe bi vî awayî bi lêv dikirin; "Çi alî ango kom; Ereb, Tirk, Kurd, Ermenî ango Misilman, Mesihî, Cihû, Durzî ji ber nijad û ola xwe, xwe di bin zextê aliyekî din de nebîne. Çi alî ango kom mafê yên din nedize û wan bê maf nehelê."

Ev daxwaza demokratîk ji aliyê nijadperêstên hov ên Îttîhad û Teraqqiyê hat redkirin û 21 pêşengên Ereb di 6´ê Gulanê de ji aliyê Cemal Paşa ve li Şam û Beyrûdê hatin dardakirin. 6'ê Gulanê bû Roja Şehîdan. 6'ê Gulana 1972'an de şoreşgerên Tirk Denîz Gezmîş û hevalên wî hatin dardakirin û 6'ê Gulana 1996'an de jî li hember Rêber Apo êrişeke bombebarkirî hat rêxistinkirin.

Madem DAIŞ´ê yekrengî ferz dikin, wê çaxe divê helwêst jî pirrrengî be. Ne tenê ji bo gelê Kurd, ji bo pêkhateyên herêmê hemûyan e. Wan dîrok rast xwend û dîroka gelan digihîne hev jî kirin esas.

Piştî şerê pirr dijwar ê 15 rojan Çiyayê Kizwanan gihişt miradê xwe. Dara Miradan a li serê Çiyayê Kizwanan dîsa bi reng û xemla dîrokî hat xemilandin. Û ji wê rojê ve nobetdarên azadiyê agirên serê çiya geş dikin.

# Şengal Parêzgeha Êzîdxanê ye



◗ Çilmêra jî devera herî bilind e li serê çiyê. Li gorî ku pêşiyên me jî dibêjin, Şêx Adî ji Lalişê çil mêran dişîne Çiyayê Şengalê da ku Şerfedîn biparêzin.



Aysel AVESTA

Çiyayê Şengalê bi navê xwe yê din parêzgeha Êzîdxanê. Vî çiyayî li hemberî 73´ê fermanan civaka Êzîdî di sînga xwe de hewandiye. Ji kaniyên xwe av da û bi siya darên xwe bû star ji bo wan. Çiyayê Şengalê di navbera Dîcle û Feratê de ye. Ji Rojhilat ber bi Rojava ve dirêj dibe. Piştî neqebekê êdî Çiyayê Kolik ber bi Rojava ve dest pê dike. Başûr û Bakurê çiyê deşt in; deştên bi xêr û bêr. Cihê herî bilind di Çiyayê Şengalê de wek Çilmêran tê zanîn û bilindahiya wî 1.463 metre ye. Dirêjahiya çiyê 100 kîlometre ye. Gelek gelî û newal di nava çiyê de hene û ber bi Başûr û Bakur ve xwe dirêj dikin. Li çiyê bi piranî darê berû hene. Lê ji ber ku gelek caran bûye navenda êrişan û hatiye şewitandin daristanên wê gelek kêm mane. Di warê erdnîgariyê de di xaka başûrê Kurdistanê de ye û li nêzî Rojavayê Kurdistanê ye. Çar aliyê Şengalê bi gundan xemilîne. Ji berê de ev der weke navenda bazirganiyê hatiyê bikaranîn. Li aliyê Başûr (Qiblet) û Bakur (Şemal) du xanê bazirganiyê lê hebûne. Xelkê herêmê, berê sewalên xwe dianîn van xanan. Li aliyê Bakur Xanesorê, li aliyê Başûr jî Xana Şawaniyan heye. Xan weke cihêseknê û bêhnvedanê dihatin bikaranîn. Dema bazirgan dihatin tevî sewalên xwe lê diman. Pirraniya perestgeh û pîrozgehên civakê li vê deverê ne. Li aliyê Başûr Qibên Amadîn, Miheme Reşa, Şêx Hesen û Melek Fexredîn hene. Ev ziyaret, zahmen li ber wan hene û xelkê herêmê diçin serdana van deveran û ziyaretî dibin. Ji aliyê Bakur ve jî Şêxê Mihema, Xatûna Fexra, Pîra Fat, Şêşim, Şêxmend, li Geliyê Kersê Şêbilqasim, Şerfedîn, Pîrê Ewran, Şêhşim, Şêx Berekat û Amadîn hene. Her wiha gelek kaniyên weke çem diherikin jî hene, weke mînak li Başûr Kaniya Solax, Kaniya Şingal, Kaniya Kizilkent. Li aliyê bakur jî Kaniya Barê, Kaniya Kersê weke Çemê Kersê jî tê naskirin. Dîsa gelek Kaniyên biçûk yên, weke Kaniya Leylê, Kaniya Şêb û Kaniya Hisênok hene.




Şehîdgeha geliyê Kersê



Parêzgeha Şerfedîn

◗ Her wiha çîrok û strana Xezala Çiyayê Şengalê, hinek jî dibêjin Xezala Hafis Paşa. Dibêjin Xezal û Hesen aşiqên hev bûne û di dema fermana Hafis Paşa de dîl hatine girtin, lewma negihane miradê xwe.



Dema mirov behsa Çiyayê Şengalê bike, hejîr tên bîra mirov. Yek ji wan deveran jî Geliyê Kersê ye. Geliyê Kersê bi darên hejîra xemiliye. Di heman demê de bi hinar û tituna xwe jî tê naskirin.Bi kaniya xwe bûye hêvî ji bo mexdûrê fermana 73 an.

## Bi hejîrên xwe navdar e

Dema mirov behsa Çiyayê Şengalê bike, hejîr tên bîra mirov. Yek ji wan deveran jî Geliyê Kersê ye. Geliyê Kersê bi darên hejîra xemiliye. Di heman demê de bi hinar û tituna xwe jî tê naskirin. Kaniya Harûniya jî bi hinarên xwe navdar e. Kaniya Barê jî dikeve rojhilatê Çiyayê Şengalê nezî Geliyê Şîlo ye. Ev herêm jî bi hejîr û zerdelên xwe tê naskirin. Kaniya Kizilkent jî bi zeytûnên xwe navdar e. Kaniya Solax ji ber ava wê diherike gelek rengên fêkî li dora Çemê Solaxê tên çandin û dibin debara xelkê herêmê. Devera herî bilind li Şengalê Çilmêra ye. Li ser serê Çilmêra qubek heye. Jixwe di baweriya civaka Êzîdî de devera bilind pîroz tê dîtin. Çilmêra jî devera herî bilind e li serê çiyê. Dîrokzan Heso Brahîm dibêje;´Li gorî baweriya civaka me çilmêr çil teyar ango çil melek ji asîman dadikevin û tên bi hawara jinan ve." Li gorî ku pêşiyên me jî dibêjin, Şêx Adî ji Lalişê çil mêran dişîne Çiyayê Şengalê da ku Şerfedîn biparêzin. Şerfedîn di baweriya civaka Êzîdî de gelek bi qîmet e. Yê ku ji van çil mêran re serkêşiyê dike Brahîm e. Her çil mêr tên ba Şerfedîn. Ji wan re tê gotin Behdîn ango Xwebexş. Ew çil mêr Şerfedîn û Çiyayê Şengalê diparêzin. Paşê ji deverên Çiyayê Şengalê jî mêr tên Çilmêran. Li Çilmêran şêx û pîr li hev diciviyan. Ji wê demê û pê ve li ser serê girê Çilmêran qub tim hebûye. Di qubê de serderî (micêwir) disekinin. Vana xwedî li qubê derdikevin û çirayê pê dixin. Di felsefa ola Êzdayetiyê de ji xwe hejmara çil pîroz e. Weke minak çilê zivistan û havînê, çilrojiya miriyan, çilê jinan (dema diwelidin). Dîsa li Rojavayê Kurdistanê gelek dever bi hejmara çil tên binavkirin. Weke Çilaxa. Yanî dema mirov li dirêjaya dîrokê mêze bike, dikare gelek çîrokên wiha zêde bike. Çilmêra di heman demê de her dem weke navendeke kombûn û parastinê jî hatiye bikaranîn. Ji ber ku devereke stratejîk bûye. Di 3´ê Tebaxa 2014´an de jî 12 siwarên hemdem li Çilmêran Êzîdî ji fermana çeteyên DAIŞ´ê parastin. Wekî din Sindiklop heye. Sindiklop jî weke cihê keştiya (sefîneya) Nebî Nûh tê naskirin. Li gor gotinên pêşiyan, dema ava tofanê rabûye, keştiya Nebî Nûh xwe li vir girtiye. Çendî av rabûye jî Sendikilop serê xwe li ber rakiriye û anehêlaye derbas bike. Ji xwe di dîrokê de xelkê Şengalê jî di van çiyayan de serî ji ti kesî re netewandine û li hemberî hemû fermanan xwe parastine. Dîsa li çiyayê Şengalê gola simoqa heye. Gola Simoqa weke cihê eşq û evîndaran jî tê zanîn. Gelek stran û destan li ser hatine gotin.



Di baweriya civaka Êzîdî de devera bilind pîroz tê dîtin.Çilmêran jî devera herî bilind ya çiyayê Şengalê ye.Çilmêra di heman demê de her dem weke navendeke kombûn û parastinê jî hatiye bikaranîn.Di 3´ê Tebaxa 2014´an de jî 12 siwarên hemdem li Çilmêran Êzîdî ji fermana çeteyên DAIŞ´ê parastin.

## 366 şikeft û geliyê şîlo

Geliyê Şîlo bi şikeftên xwe navdar e. Li gelî 366 şikeft hene. Li gelî yek kaniyeke avê heye û ji bo wan şikeftan av ji kaniya Şîlo hatiye belavkirin. Li gorî baweriya civakê li geliyê Şîlo cin jî hene. Ji lewma heta niha jî qala cinê vê herêmê tê kirin.

Li pişta Geliyê Şîlo, Çiyayê Kolik heye. Çiyayê Kolik jî bi kewên xwe navdar e. Kewê Çiyayê Kolik ti caran nareve û serî ji kesî re danayne. Ev kew ji derveyî kewê li ser axa xwe ti kewên din qebûl nake. Dîsa Xezalên vî çiyayî jî gelek bi nav û deng in. Kaniyên Birşîrîna Heyraman û Xeremoz lê hene li gorî gotinan Xezalên Çiyayê Şengalê carê diçûn ser van kaniyan û av jê vedixwarin. Heta tê gotin, gelek lehengên Êzîdxanê yên wekî Derwêşê Evdî jî çûne vê herêmê ango çûne nêçîra xezalên çiyê. Gola Xatûnê jî dikeve rex Çiyayê Kolik pişta Hesekê û nêzî gundê Holê ye. Li gorî temen mezinên civakê navê Hesekê ji Heska tê. Heska niha jî li Şengalê navê Eşîrekê ye. Gola Xatûnê weke Gola Xatûna Fexra jî tê naskirin. Xatûna Fexra li vê herêmê xwedawendî kiriye û weke pêşenga olî jî tê nasin. Heta niha jin her sal ji bo Xatûna Fexra rojî digirin. Çiyayê Şengalê li gel êş û fermanan bi gelek çîrokên evînê jî navdar e. Yek ji wan jî çîroka Leylê û Mecnûn e. Heta niha jî li gundê Zerwa yê Şengalê kaniya Leylê heye. Dîsa destana Xensê û Reşo heye. Xensê û Reşo ji gundê Heyalê bûne. Gelek çîrok û stranên li ser evîna wan hatine gotin. Her wiha çîrok û strana Xezala Çiyayê Şengalê heye, û hinek jê re dibêjin Xezala Hafis Paşa. Dibêjin Xezal û Hesen aşiqên hev bûne û di dema fermana Hafis Paşa de dîl hatine girtin, lewma negihane miradê xwe. Şengal di heman demê de bûye hêlîna lehengên bi nav deng yên weke Derwêşê Evdî, Mihemeyê Evdo, Zerêfa Osê, Memoyê Elî, Xelef Sincara, Esê Mecdîn, Kekê Kemal, Xeriyê Şêx Xidir, Berxwedan, Bêrîvan, Lava û Mam Zekî Şengalî ku ji bo parastina ax û rûmeta Êzîdîxanê li ber xwe dane û serî ji dagirkeran re netewandine.





Li Şengalê gelek kaniyên weke çem diherikin hene.Li Başûr Kaniya Solax, Kaniya Şingal, Kaniya Kizilkent. Li aliyê bakur jî Kaniya Barê, Kaniya Kersê weke Çemê Kersê jî tê naskirin.Kaniya Kersê havîna sare û zivistanan jî germe.Ev kanî di heman demê de weke cihê seyranê jî tê bikaranîn.

## Anne Sexton

# Pêşîkêşa gunehweşandinê*

KEWA BERBANGÊ



Kawa NEMIR

Di gelek qonaxên jiyanê de, Helbestkara Emerîkan a ku bêtir bi nav û deng e bi pergala otobîyografîk a bênavbirrî ya helbesta xwe û bi dengê xwe yê "gunehweşên" ê takekesî. Vê taybetîya geş û gurr a tevayîya helbesta wê ta roja îro jî hiştiye ku xwîner bi şaşî yeqîn bikin wekî gunehweşandina wê xwe dispêre hemû bûyer û qewamên di jîyana wê de.

Anne Sexton di 9'ê Sermaweza 1928'an de li bajarê Newtonê yê parêzgeha Massachusettsê ji dayîk bûye. Du xwîşkên wê yên ji wê mezintir hebûn û keça malbateke dewlemend bû. Sextonê li dû têkçûna rewşa xwe ya derûnî û depresyona giran dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Wê hê di çaxa xamatîyê de çend caran hewil daye ku bi rê û awane cîyawaz xwe bikuje, lewma jî guhê psîkîyatrîstê wê Martin Orne, yê ku heta bi xwekuştina wê hewil daye ku wê pak bike, her li ser wê bûye, di gel vê hindê Sextonê jîyanek borandiye ku tijî bûye ji kêşeyên takekesî. Psîkîsyatrîstê wê, wekî parçeyekî terapîyê, han daye ku ew helbestan binivîse, wê jî bi ya wî kiriye, baş bûye wisa jî qewimîye, lewma îro ro li ber destê me berhemên wê yên poetîk ên nayab hene.

A rast, Sextonê di sala 1957'an de dest pê kiriye metnên cidî yên wêjeyî nivîsîne û di sala 1960'î de pirtûka xwe ya pêşîn a bi navê Berev Tîmarxaneyê û Veger daye weşandin ku di heyna xwe de civatên wêjeyê gelekî pesnê wê dane, wekî cîyê heqîyê. Sexton di helbestên xwe de li dora babetên her wekî kurtajê, ketina kirasan û sêhr û cizba xwekuştinê dinivîsî ku bi raya wê babetên welê berîya wê hingê tevî babetên helbestê nebûbûn, lê bi raya pirranîya helbestkarên Anglo-Sakson ên wê heyamê, "ne guncan bû û çênedibû" ku helbestê berê xwe bida wan babetên navhatî. Lê, şayanî behsê ye, qenebe sêhr û silûka babeta xwekuştinê, di wê heynê de kiriye ku gotina Anne Sextonê û ya Sylvia Plathê bikevine qabekê; di henga semînereke li ser nivîskarîyê ya li Zankoya Bostonê ya helbestkar Robert Lowell de Sextonê û Plathê hev nas kir û bûne hevalên hev. Vê hevnasînê kartêkirineke cîyê afirînerîyê li helbesta her duyan kir, û dema ku Plathê di sala 1963'yan de xwe kuşt, Sextonê der barê xwekuştina wê û xwezîpêanîna xwe ya bo wê de ew helbesta xwe ya diltezîn a bi navê Mirina Sylviayê nivîsî.

Ji ber xebatên xwe yên wêjeyî, Sextonê Xelata Dibîranîna Shelley wergirt, di sala 1967'an de jî, ji ber berhema xwe ya bi navê Bijî yan jî Bimire (1966) Xelata Pulitzerê.

Anne Sexton, ji alîyê gelek civatên wêjeyê û akademîk ve, wekî "helbestkareke gunehweşên", di nava refên helbestkarên gewre de her wekî Robert Lowell, Sylvia Plath, John Berryman, Allen Ginsberg, Theodore Roethke û ta dawîyê tê hesibandin. Her bi çi awayî be, Sexton yek ji gewretirîn helbestkarên sedsala 20'an e bo zimanê Îngilîzî û pêwîst e em li qelemê bidin ku wê ew deh dîwanên xwe, ku ya bi navê Hemû 'Ezîzên Dilê Min (1962) baştirîn dîwana wê tê hesibandin, li jêr şert û mercên terapîya psîkîyatrîk a heta mirina xwe û têkçûnên xwe yên derûnî yên berdewam nivîsîn.

Sextonê, axirî, di 4'ê Kewçêra 1974'an de xwe kuşt.

* Ji bo ku zanyarîya der barê arşîva xebatên min ên wergerê de li vir tomar bibe, ji salên 90'î heta niha min 56 helbestên Anne Sextonê ji Îngilîzî wergerandine Kurdîya Kurmancî û ev hê jî wekî pirtûk nehatine weşandin. Her wiha, ev pêlek e wergêr Rojda Yaşik jî hindek berhemên wê werdigerîne.

**(K. N.)**

**Têbîniya PolitikArtê:** Me rengê nivîsa Kawa Nemir neguherand, ji ber ku wergêr jî yên wî ne.

### Jûra Jîyana Min

Li vir,
li jûra jîyana min,
bireser diguhêrin bê rawestan.
Xwelîdankên ku mirov bi hundirên wan de bigirî,
birayê jankêş ê dîwarên ji daran,
çil û heşt tûşên textîloyê,
her yek bîbikê çavan ê ku çu caran nayê girtin,
pirtûk, her yek pêşbaz di pêşbazîyeke bedewîyê de,
kursîya reş, darbesteke kûçikan a malê Naugahydeyê,
prîzên di dîwêr de,
bendewar mîna şikefteke mozan,
xalîçeya zêrîn,
galegala panî û pêçîyan,
bixêrî,
kêreke li hêvîya yekî ku were rahêlê,
sofa, pirr westîyayî ji lêxebitîna matoşqeyekê,
têlefon,
du kulîlkên ku di nava ranên wê de reh û rîş digirin,
derîyên
ku vedibin û têne girtin wekî şehên deryayî,
çirayên
ku diniçînine min,
dadigirisînin hem xwelîyê, hem jî tîqetîqê.
Pencere,
pencereyên ku dikin ji birçînan bimirin,
ku daran wekî bizmaran dikutine nava dilê min.
Ez her roj cîhanê li wê derêkê dermale dikim,
tevî ku balinde diteqin
çep û rast.
Ez cîhanê li vir jî dermale dikim,
biskuwîtên tûlleyan pêşkêşî maseya nivîsê dikim.
Belam, çu tişt nîn e wekî ku xuya dike.
Bireserên min xewnan dibînin, dikevine dilqine nû,
bi zora, wisa xuya dike, hemû peyvên di destên min de
û deryaya ku wekî bombeyekê diteqe di gewrîya min de.

### Baçermok

Çermê wî yê berbad
ê ji alîyê bazirganekî ve hatî rakişandin
wekî çermê min e, va ye di nava tilîyên min de,
texlîtekî tevnê, texlîtekî beqan.
Dema ku hê nû ji maka xwe bûbûm, yeqîn rûyê min bi vî qasî hûrik bû
û berîya ku ez ji maka xwe bibûma, yeqîn min dikaribû bifirim.
Ne xweş e; hûn lê, bi tenê xêlîyeke ji çerm
ji milên min heta navtenga min.
Ez bi şev jî difirim. Te dî yek min bipelişîne bi erdê ve,
ji bo ku neyêm dîtin.
Di Gelawêjê de, renge dar bilindî stêrkan bûn,
ez di tarîya boş de firîyam ji pelekî bo pelekî din.
Heke we ez bi fenera xwe biqefaltama,
we yê termekî gulfam î bibask bidîta,
kolîpoşman, terka zikê maka xwe dayî, sertaser di nava kurk de,
deng ketî, di ser xanî û artêşan re tev digerîya vedigerîya.
Lewma kûçikên mala we bêhna min hildikin.
Ew pê dizanin ez tiştek im divê bême girtin
li cîyekî li gorristanê, serejêr şor
wekî guhanekî bêşêwe.

### Piştî Auschwitzê

Hêrs,
bi qasî qinareyê reş,
min digire ji nişkê ve.
Her roj,
her Nazîyekî,
di 8'ê serê sibehê de, zarokekî virnî digirt,
ji bo taştêyê ew diqeland
di taweya xwe de.

Û mirin bi kuja çav lê dinihêre
û diniqniqîne gemara di binê neynûka tilîya wî de.

Mirov hov e,
bi dengekî bilind dibêjim.
Mirov kulîlkek e,
ku divê bê şewitandin,
bi dengekî bilind dibêjim.
Mirov
balindeyek e, mişt herrî,
bi dengekî bilind dibêjim.

Û mirin bi kuja çav lê dinihêre
û qûna wî dixurîne.

Mirovê pêçî biçûk î helesor,
tilî mûcîzat,
ne perestgehek e,
gomek e,
bi dengekî bilind dibêjim.
Bila mirov çu carî dîsa fincana xwe ya çayê raneke.
Bila mirov çu carî dîsa pirtûkekê nenivîse.
Bila mirov çu carî dîsa sola xwe di pê neke.
Bila mirov çu carî dîsa çavên xwe raneke,
şeveke Tîrmehê ya nerm.
Çu carî. Çu carî. Çu carî. Çu carî. Çu carî.
Ez wan tiştan bi dengekî bilind dibêjim.



## Annaya Ku Dîn Bû

Annaya ku dîn bû,
kêrek heye di binçenga min de.
Dema ku li ser pêçîyên xwe disekinim, fîtikekê li peyaman dixim.
Aya ez cureyekî nexweşîya jêkvegir im?
Aya min tu dîn kirî?
Aya min kir ku deng tirş bibin?
Aya min gote te tu biperikî pencereyê?
Li min megire. Li min megire.
Bibêje, te nekir.
Bibêje, na.
Bibêje.

Peyvên Meryemî bibêje balgîyê me de.
Mina danzdeh salîya jar û bejndirêj hilde
behere hembêza xwe ya bi kor de çûyî.
Bike pistepist wekî guleke cimaetê.
Min bixwe. Min bixwe weku bixwî krempûdîngekê.
Min bihebîne.
Min hilde.
Hilde.

Min agehdar bike li ser bar û doxa gîyanê min.
Kiryarên min ji binî ve eşkere bike bo min.
Zengileke zoma dirêjî min bike, bihêle ez guh bi ser de kerr bikim.
Alîkarîyê bike ku pêyên xwe tê kime zengûyan, komekîya gereke komelî bide.
Gunehên min ên di lîsta beqêl de bijimêre, bihêle ku bikirrim.
Aya min tu dîn kirî?
Aya min dengê bihîstoka te rakir, sayrinekê tu kerr kirî?
Aya min derî li derûnnasê bisimbêl vekir,
li yê ku tu wekî destgereyeke zêrîn kişandî derve?
Aya min tu dîn kirî?
Anna, ji gorrê ji min re binivîse!
Tu ji arîyên termê şewitandî û pê ve ne tiştek î, lê li gel hindê
rahêle pênûsa Parker a min dayî te.
Ji min re binivîse.
Binivîse.

## Pîr

Ziravê min diqete ji derzîyan.
Hevreşî bûme ji mitêl û tûpên kaûçik.
Hevreşî bûme ji sikûmên ku nas nakim,
êdî ji min we ye ew mirin dest pê dike.
Mirin mîna xewnekê dest pê dike,
tijî ye bi hûrmûran û tîqetîqa xwîşka min.
Em xama ne, me daye ser rê em dimeşin,
ser bi serê rêya ku diçe Damariscottayê,
em tûşînan hildikin û berhev dikin.
Susankê, ba kir wê, Susankê,
te mêzera xwe ya teze lewitand.
Çi qasî şêrîn e –
min devê xwe pê tepisand,
şînê şêrîn fît dibe
ser bi serê rêya ku diçe Damariscottayê.
Tu çi dikî? Ji min bigere!
Qey tu nabînî ez xewnan dibînim?
Tu di xewnekê de çu caran ne heştê salî yî.

## Li Mûzexaneya Kûr

Rebîyo, Rebîyo, ev çi qorzîyeke sosret e ez lê me?
Qey nemirim, qey xwîn danekişîya ji qazoxê de, pişik
neperpitîn ji bêhenasetîyê, qey li wê derêkê nemirim di ber
gunehê yekî de, devê min ê tirş ji sawîran negerîya qey?
Laşê min berra jî çû? Ez berra jî mirim?
Hêşta, pê dizanim, ez li vir im. Ev cîyekî çawa ye?
Sar û sosret e, jîyan bi min vedide. Min derew kir.
Erê, min derew kir. Hekena, di nava tirsonekîya kambax de,
dê laşê min ez bernedama. Ez destê xwe di cawê
xweşik didim û dêmên min sar in.
Ku dojeh ev be, nexwe wê nikaribûya zêdetir bibûya,
ne bi qasî ku gotibûne min, derasayî, ne jî xerab.

## Bêhêvîtî

Ew kî ye?
Rayeke şiva hesin a ku diçe dojehê?
A ku dişikê wekî şiveke tekberan?
Hêvîya ku ji nişkê ve davêje di ser kêzînê re?
Evîna ku wekî tifê dadikişe di borîya ava gemarî re?
Evîna ku digot, heta hetayê, heta hetayê
û paşê wekî kamyonekê di ser te re diçe?
Qey tu duayek î ku serav dibe di reklameke radyoyê de?
Bêhêvîtî,
Kêfa min ew qasî nayê ji te re.
Tu li cil û bergên, yan jî li cixareyên min nakî.
Bi gewdeyê xwe yê mezin bi qasî debabeyan
bo çi li vir cî ji xwe re xweş dikî
û berê lûleya xwe didî nîvê temenekî?
Heta ku tu xwe li vir, li reh û rîşên min diedilînî,
min didî zorê ku derkevim ji jîyana ku
ev qasî ji zû ve ye bûye navika min,
qey te nikaribû binizilîyayî nava darekê?

Baş e!
Ez ê te bigirim û bi xwe re derxime gera
ku ew qas salan
zar û zimanê çek û rextên min lê lal bû.

## Kûçeya Dilovanîyê ya 45'an

Hate ber serê min,
min di xewna xwe de
'eynî wisa dît misêwa,
rast wisa hate ber serê min,
ku ez li ser Girê Fenerê hevraz berjêr dimeşim,
li nîşaneya kûçeyekê digerim –
kûçeyeke bi navê KÛÇEYA DILOVANÎYÊ.
Ne li wir e.



*em kurd bi zimanekî çiyayî ji we re dibêjin*
*li çola xwe vegerin*
*û heta hûn dikarin qûma xwe bi serê xwe*
*dakin*
*êdî fam bikin*
*kevir ji hebên qûmê girantir in*
*çiya ji çolan bilindtir in*

*(Ji helbesta Herba Kobanê)*

*Rênas Jiyan*